

Dumahîk : Gelên Ereb...

Destlat herdem ji hêla zabitekî yan ji hêla partiyeke takane ve hatiye hukumkirin, û gel jî bi hemî nof û pêkhatiyên xwe, ji dadê, wekheviyê, azadiyê û gelek mafên xwe yê rewa bêpar maye, û ji hemî karûbarên siyaseta bilind a dewletê jî hatiye dûrxistin.

Li ber ronîya van rastiyan, roj bi roj nakokî di navbera gelên Ereb û destlatdarên wan de kûrtir dibe, û qeyran bi hemî rûdawên xwe rû didin. Ji ber ew pirsên giring ku ji salan ve hene û pir zengirîne, û destlat jî li ew rewşên xirab mikûr netê û înkâr dikin, yan jî hewil didin ku sazûmanên xwe yê rizîyayî perpîn bikin, lê belê dîn jî dizanin ku ew derdên giran ku bi salan laşê dewletê dikolin û gel û civak jî wêran kirine, bi perspankirinê derman nabin. Û hemî kes pê bawer bûye ku çareserkirina û guhertinên rast û bingehîn, di hemî warên sazûman û destlatê de dest pê dike, û ji bilî wê tu rê tune ye.

Rûdaneke xembar a hatûçûnê!

Roja yekşembê 10ê Nîsanê, li bajarê Şamê, li ser rîya Dîmas, herdu hevalên partiya me yê ciwan: Sabir Mihemed Elî Îsa(31 salî) û Tevger Xelîl(fehîm) Silêman(23 salî) di rûdaneke hatûçûnê de jiyana xwe ji dest dan.



Sabirê Îsa Tevgerê Fehîm

Hevalê Sabir, *Sabir Mihemed Elî Îsa*, doktorê(beyteriyê) û bavê kurekî ye, ew jî mîna sedhizarê Kurdên Cizîrê ji ber pilana serhijmara awarte ya sala 1962an ji mafê hilgirtina nasnameya welatê xwe Sûriyê hatiye bêpar kirin, bi malbatî koçberî Şamê bûye û dest bi xebatê kiriye.

Hevalê Tevger, ciwanê 23 salî, ji ber ku navê wî yekcar di lîsteyên dewletê de tune ye, ji wê girûpa bi navê (mektûm) têne bi

navkirin, ji bilî sinifa 9an pê ve ne xwendiyê. Ew jî li Şamê, ji bo debara malbata xwe dixebitî.

Bi beşdariya gelek mirov, gundî, dost, heval û hogiran, termê herdu ciwanên hêja di goristana Til Merûf de hatin veşartin. Bila serê malbat, dost, heval û hogirên wan sax be, cihê wan buhuştta rengîn be!

Sê birûskên çêrokî

(1)

Gundekî di nav herdu pêsîrên lêlûna dêrînî de , xwe li ser enîşkeke zamdar palveda bû, ewî mîna dapîreke qisawetxwar stêrkên ezmên yê wek zerdelên



Ebdilmecit Şexo

Basotê ji neviyên xwe re dijmartin û bi dengekî nermîn û hêminî ewanan dikirin xewa ne xew . Lê nobetdarekî mîna qantirê Aleman bi pekandina kevirên bin lingên xwe ,serê xewa ne xew jî şikaaand.

(2)

Di şikefta Duderîya min de , zarokek 40 hezar sal nobetdar bû, gava pêriyên bajarê min rasterast ji wî pirsîn; ma tu, me jî nasdikî ? Hestiyên nobetdar lerizîn, kenîyan, dagrîn û gotin : Çiqas Mîtanîyên we sersiyên xwe li min dikirin û ji min hezdikirin ! Lê hûn dikanin ji min re bêjin ; rewşa Nefertîtî çawa ye ?

3)

Du şivan simêlbadayî , pezên xwe li ser sîngê çiyayê Lêlunê de diçêrandin, taveke baranê bi zerp lêkir , şivanan pezên xwe bi lez ajotin nava şikefteke nîzîk, şivanekî di wir de pirtûkek çiriyayî , rizyayî ya Cegerxwîn (Kî me ez) dît. Şivanekî ji yê din pirsî ; çiyê ev ? Ewî gote hevalê xwe , pir mixabin ,ez jî mîna pir siyasetmedarên me hîn bi kurdî nizanîm bixûnim, lê va ye ez wêneya Cegerxwîn li ser pirtûkê dibînim û herweha jî pir baş tête bîra min , ku beriya 40 salî ,şagirtên dibistana Efrînê cejna Newrozê di vê şikeftê de bi nehîni pîroz dikirin û dilên hevdu bi hêviyên cejnên meziiiiin geşşş dikirin .

Efrîn: 21.03.2011-Ji malpera Efrîn